Newroz Hejmar (83) Rûpel (12) Sibat 2009z – 2620k

Endezyar Ebdîn Xelîl jî goç barkir

Îro jî Di 24-2-2009 an de, stêrkek geş, ji asîmanê gundê Berbenê herêma Efrînê vemirî û dilê bavê Rêzan rawestî.

Belê gelî hevalan: Mamoste Ebdîn ,di sala 1953 an li gundê Berbenê ji dayîk bû, fêrnama Endezyariyê sala 1981 an ji zanîngeha Helebê wergirt. Pişt re di navça çandî ya Efrînê de xebitî û ji ber ku di karê xwe yê rojane de ne qels û sist bû ew ji aliyê hemû hevalê xwe yên kargehê ve, cihê rêzgirtinê bû û bêdudilî ta roja çavdamrandinê, di karê xwe de berdewam bû.

Heval Ebdîn bavê Rêzan, sala 1974 an derbasî nav tevgera Kurdî bûye, û di seranserî jiyana xwe ya rêxistinî de, bi gelek çalakiyên têvel beşdar bûbû û ta roja goçbarkirinê, di komîteya herêmê de dixebitî. Roja 25-2-2009 an, bi beşdariya hezaran dost û hevalan û li ser milê komikên folkilorî, di goristana gundê Berbenê de, binax dibe. Hezar hezar dilovanî, li giyana bavê Rêzên be.

Li dawiyê em serê xwe û malbata wî xweş dikin .

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de